# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (266):

**Mirina temenmezinekê ji qehra re, girtinine bêsûcane, "Ebû Welîd El'ize" werza/mûsima "Kotana" talan dike, destdanîneke fere û berevajîkirinin avakirinê li Bajarê Efrînê, şewtandina daristanekê li "Gazê"**
























Di durveyê de, giştînamak "Şalyariya/Wezareta Berevaniyê li ba Hikometa Sûrî ya Demkî" li destpêka werza zeytûna ya îsal -li gor jêderine ragîhandinî yen xwecihî- ji "pêkhateyên pê ve girêdayî" daxwaz kir ku hêsankirinan ji bo berefkirina berhema zeytûna ji cotariyan re pêşkêş bikin, û yekcar wergirtina baceyên pereyî yan şênberî ji werza zeytûna -di bin çi navî de be- qedexe kir, û herweha jî "Fehîm Îse serkêşê Feyleqa Diwem - Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" naveroka giştînamê gîhand ên bi xwe ve girêdayî da ku pêgiriyê/pabendiyê pê bikin û yê pê neke jî dê bikeve bin "lêpirsîna zagonî/yasayî"; Lê, tiştê li ser erdê çêbûye/pêk hatiye pîstirî werzên berê bû, ji dizînên fere ve bigir, ta şelandin û berdewamiya destdanînê li ser milyonan darên zeytûnê û ferzkirina vêrgiyên bilind.

**Ev jî hin bûneyên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Mirina jineke temenmezin ji qehra re:**

Li 6.11.2023an. Z, temenmezina Kurd "Melek Xelîl Îbo /63/sal" - jinebiya Dilovanber "Menan Hisên Ibrahîm" ji qehra re mir, di nexweşxaneyeke Efrînê de, piştî heftakê ji birina wê bo dermankirinê; Ji ber ku sekna mejî vê re çêbû, piştî êrişa "Esmer" - yek ji serkêşên Milîseyên "Lîwa'i Siqor El'şemal" li ser, kişandina çekan di rûyê wê de, gefdana wê li nav zeviyê zeytûna yê malbata wê û qedexekirina wê û karkiran ji berdewamkirina kar, bi behaneya berefkirina wê ji zeytûna re bê erêkirina wî.

Û "Esmer" razî nedibû ku mala wê li Gundê "Elîcaro" - Navça Bilbilê radestê bike, di navboriya salekê ji vegera wê ji ciyê derbideriyê - Heleb/Havîna 2022an. Z, bi ser daxwazkirinên li dû hev re, û neçarbûna rûniştina wê di mala birayê xwe de.

Û terma wê jî, di bin çavdêriya yê ku zordarî lê kiriye re, derbasî hewşa mala wê bû da ku xatirxastina dawiyê lê were kirin, li dema oxirkirina wê ya dawiyê.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

- Li 1.11.2023an. Z, Xort "Dîko Reşîd Xelîl /25/sal" ji xelkê Gundê "Qirigolê" - Navça Bilbilê, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê ve, li Bajarê Efrînê, bê ku em kanibin tuhmetên wî bi dest bixînin.

- Li 5.11.2023an. Z, Hemwelatî "Menan Samî Oso /38/sal" ji xelkê Gundê "Gemrûkê" - Navça Mabeta li B. Efrînê, piştî vegera wî ji aliyê penaberiyê - Heleb bo herêma xwe bi rengekî yekser, bi tuhmeta têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (R.X) a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

- Li 6.11.2023an. Z, Hemwelatî "Ehmed Reşîd Çawîş /47/sal, Silêman Elî Çawîş /68/sal" ji xelkê G. "Gemrûkê", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Mabeta", bi tuhmeta têkildariyê bi (R.X) a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ne.

**= Werza zeytûna:**

- Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" (yên ku "Fehîm Îse - yê Turkman û ji Gundê Girê Eşqê/Til El'hewa yê nêzîk Bajaroka Çobanbegê/El'ra'î li Herêma Babê Bakurê Heleb") dest dîdinin ser bi sedhezaran darên zeytûnê (yên nişteciyên Kurd ên resen ên zorane koçberbûyî yan jî ne li wir), bi taybetî jî li herdu Navçeyên "Şera û Bilbilê"; Bi ser de jî ferzkirina vêrgiyên bilind bi riya berpirsiyarê nivîsgeha wan a abortiyê "Ednan Xuweylêd ê bi Ebû Welîd El'ize tê navdan" li N. Bilbilê, yê ku îsal werza bi hezaran darên zeytûnê li Gundê "Kotana" bi zorê biriye, jê: "/100/dar ên Ehmed Reşo Xelo ê zorane koçberbûyî, /80/dar ên Ehmed Henan Çolaq ê zorane koçberbûyî, /450/dar ên zaroyên Dilovanber Ebid El'rehman Mistefa Horî yên zorane koçberbûyî, /300/dar ên Hisên Mihemed Şêxo yê ji şeş heyvan ve vegeriye gundê xwe, /500/dar ên zaroyên Dilovanber Îso Ehmed Me'imûş ên zorane koçberbûyî, /1000/dar ên Hesen Seydo Bîlal ê zorane koçberbûyî, /800/dar ên Nezmî Îbo yê zorane koçberbûyî", bi ser xizmet û lêçûna du salan de; Weha rêbendên "El'sultan Mûrad" çiwalin zeytûna (her yek dora 85 KG) bi zorê ji barekî ku di ber re derbas dibe distînin.

- Li Gundê "Dumiliya" - Navça Reco, "Ûsame Rehal/Ebû Hesen Obame - cîgirê serkêşê Milîseyên Lîwa'i 112" werza dora /200/darî zeytûnê yên zaroyên Dilovanber "Bekir Mûse" yên zorane koçberbûyî bi zorê stand, bi ser xizmet û lêçûnên ku rêdankerên/wekîlên wan kirine, di navboriya du salan de.

**= Avahî/avakirin li Bajarê Efrînê":**

Piştî desteserkirina Artêşa Turkiyê û Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ji Bajarê Efrînê re li Avdara 2018an. Z, û bi ser de herikandina anîndeyan ji parêzgehine din en Sûrî, dest hate danîn ser dora 70% ji mal û dîkanên wê, û li salên dû re ji nû ve avahî û hin avahî binevahiyên giştî yên nû hatin avakirin, vê re jî gelek berevajîkirin û rêderketin û binpêkirin ji zagonên avakirinê re hatin kirin, emê jê van bi bîr wînin:

- 70% ji avahiyên nû bê rêdankên yasayî yên li ba encûmena xwecihî hatin avakirin, yanê tenê bi erêkirina nivîsgehên milîseyan -her yek di çarçewa bandoriya xwe de- û piştî wergirtina vêrgiyên diravî yên mezin; Yanê xwediyê avahiyê kane pêgiriyê bi pilana rêxistinî ya bajêr neke, û şert û mercan (şênberên avakirinê, rûber, hejmara qatan û yên din) bide berevajîkirin û cih nîne, û herwaha jî tu xwendinê ji erdhejê re çêneke û cîbicî neke.

- Nivîsgeha kontirolkirina avakirinê ya şaredariyê li ba encûmena xwecihî kontirolan di dermafê hemî berevajiyan de dide orgenîzîkirin û ji "aliyên ewleyî/asayî û dadwerî yên taybet re" dişîne, lê bê sûd dimînin, ji ber ku li orta bandoriya serkêşên milîseyan û hukumdariya wan dikevin, ji bilî ên berevajî zagonê çûne û ne di bin parastina milîseyan de.

- Xwediyê avahiya ku hemî şert û merc û rêdanka zagonî pêk anîne, bi riya odeya endezyaran û encûmena xwecihî, ji ferzkirina vêrgiyeke diravî ji aliyê milîseyan -her yek di çarçewa xwe de- nafilite.

- Gelek dîkan û çêgeh li ser asta qateke tenê hatin avakirin, ji serkêşên milîseyan re, li ser perçerdên nişteciyên resen bê erêkirina wan an dandina nirxa wê.

- Hin perçemal ji serkêşên milîseyan re hatin avakirin, li ser avahiyên berê, weke berevajîkirin ji mafê arzîkirinê û hejamara qatan û mercên sazkeriyê re.

- Avakirina hejmarek ji mizgeftan li ser perçerdên arziyên taybet ên nişteciyên resen, bê ku tiştek li şûne ji xwediyan re were dandin.

**= Şewtandina daristanan:**

"Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîpên/tîmên wê hin agir vemirandin, li ihraca "Girê Gazê/Tilxazî", li rojên 3-4-5/11/2023an. Z û li 7.11.2023an. Z jî, û li gor jêdereke xwecihî îhrac li "Sirta Dirêj" li Çiyayê "Mixtar Cemîl Mihemed" li Gundê "Gazê" - Rojavayê Bajarê Efrînê dikeve, rûbera wê dora /8/hiktara ye, ew ji aliyê çekdarên Milîseyên "Firqit El'hemzat" ve ji bo êzingkirin û bazirganiyê hate şewtandin, û şewtandin mebestkirî bû, da ku li ser piroseyên qutkirinê bêne nixumandin û veşartin, ên ku di wêneyên berevaniya sivîl ên belavkirî de bi zelalî diyar dibin.

Derxistina wê giştînamê bixwe lêmikûrhatuneke guncawî ye ku erzaqên/werzên nişteciyên resen -bi taybetî werza zeytûna- rastî/tûşî bendkirin û talanan dibin, vêca çawa û li kû û kengî lêpirsîn û cezakirina dizan (ji endam û serkêşên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî") û berpirsiyarên wan dê werin kirin, an jî rêgirek ji wan binpêkirinan re dê were danîn?!

12.11.2023. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

---------------------------

**Wêne:**

- Temenmezina Kurd a ji kerba re mirî "Melek Xelîl Îbo", û oxirkirina terma wê di mala wê ya desteserkirî de, li Gundê "Elîcaro" - N. Bilbilê.
- Ê bi "Esmer" tê navkirin, yek ji serkêşên "Siqor El'şemal" û berpirsiyarê G. "Elîcaro" - N. Bilbilê.
- "Fehîm Îse" serkêşê "Feyleqa Diwem - Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" digel "Hisên Hemadê - Şalyarê Bergiriyê li ba Hikometa Sûrî ya Demkî" û weha jî ligel "Dewlet Bahçelî - serokê Tevgera Netewî li Turkiyê".
- Giştînama "Fehîm Îse" bi taybetmendiya werza zeytûna, 9.10.2023. Z.
- "Ednan Xuweylêd/Ebû Welîd El'ize" - berpirsiyarê nivîsgeha abortiyê a Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad".
- Avahiyek li dor navenda çandî li B. Efrînê, ji ber erdhejê ziyan dîtiye û ji rûniştinê re nabe, bi sedema avakirina du qatên din li ser ji aliyê serkêşekî Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" ve - ji raporeke wênekirî ya ragîhandvan "Ela'i Yûnês", li Reşmeha 2023. Z.
- Pêxistina agiran bi îhraca G. "Gazê/Til'xazî", û kokên darên qutkirî bi zelalî diyar dibin.